Serxwebûna Kosofo
Rê li pêş xebata gelên bindest dûz û hêsandike

-Xemxarê Kurdaxî -

Li 17 . 2 . 2008 an , serokşalyarê kosofo Haşêm Tacî , li ser daxwaza gelê Alban ê Misilman , biryara serxwebûna Kosofo ji Sirbiya sitand . Hêjaye em bi bîr wînin ku, Encûmena parastina navnetewî (Meclês el- emin elqewmî), sala 1999 , biryara 1244 stand û li ber roniya wê biryarê, otonomiyek fere di hundir Sirbiya de , da kosofo . Ji xwe ew biryardana piştî gelek işkence , zehmetkêş û komkujiyên olî ku , dewleta Sirbiya bi serê xelkê Kosofo kirî hat .Piştî danezana serxwebûna Kosofo , 15 dewlet Ewropî mina : Firansa, Îtaliya , Isturaliya…….Emerîka , Kongira Islamî , Turkiyê , Birêtaniya û gelek dewletên dî , biryara erêkirin û piştgiriyê ji danezana serxwebûna Kosofo re dan û xuyakirin . Li aliyê din 6 dewlet Ewropî mîna Romaniya , Qubrus , Ispaniya , ……H.W.D , Rûsiya , Sîn…..rikberiya xwe jê re dan xuyan .Û hinên dî jî ta niha ne erê ne na mane . Piştî danezanê bi rojekê Prlemana Kosofo şalyarê dewleta Kosofo ya derve bi nav kir , û Yekîtiya ewropa jî berpirsiyrê xwe yê têkeliyên derve Xafiyêr Solane şand wir . Beligradê jî balyozên xwe ji hemî dewletên ku , ji serxwebûna Kosofo re erêkirine kişandin û dijîtiya xwe bi hemî çalakiyan ji serxwebûnê re diyarkirin.

Dijîtiya Bligradê ji serxwebûna Kosofo re ji me ve diyar e . Ji ber ku,Kosofo jê veqetî ye. Û dewletên din yê ku, jê re erê nekirine xuyadibe ku, li dij berjewendiya wan e û ji netewên ji nav xwe bi tirsin ku, bidin şopa Kosofo . Wek Ispaniya ji navça elpask bi tirs e , Rûsiya ji gelên Belqan di nav xwe de bi tirs e……..Lê , Turkiyê ji bona beşê Qubrisê yê Turkî erêkir , lê ne vehesî ye . Ji ber ku , dizane pirsek weha (pirsa gelê Kurd) li pêş wê ye jî .Yên ne erê ne ne jî , hîn di hêlekanê de wendayî ne , nizanin çi helwestê bistîninn .

Ji ber ku , em bi azadî û biratiya gelan bawer in , û em tekûzin ku , ev gav û nimûneyên mîna serxwebûna Kosofo , mînakinî ronak in wê rê li pêş azadiya gelên bindest dûz û hêsan bikin û xuya dibe wê herin serî jî . Vêca em xwe li rex helwesta erê ji serxwebûna Kosofo re dibînin . Û em hêvî dikin ku , rojên li pêş wê ên azadî , aştî , û wekheviya gelan bin .

Heval Ebdil-mecîd ji nav me barkir

Di 19 -02-2008 an de, heval Ebdil-mecîd Remo Silêman, ji gundê Îska, herêma Kudaxê, çû ser dilovaniya xwe. Heval Ebidil-mecîd, di sala 1949 an de ji dayîk dibe û di sala 1980î de, derbasî nav refê partî dibe. Ji wê demê ve û ta dawiya jiyana xwe bi dil û can di nav gel de dixebite. Lwere jî, di nav gel de bi navê **Xalo** dihate nasîn. Li ser gorna wî hevalekî gotina partiya wî pêşkêş kir û li ser xebat û sinciyên wê rawestî.

Bi navê komîta rêvebir ya belavoka Newrzê, em serê xwedî, gundiyên Îska û hevalên wî saxdikin.